
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :917 21-Mijdar- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | D | ■ | P | E | R | E | ■ | M | Î |
| 2 | A | X | ■ | C | A | N | Î | ■ | N |
| 3 | N | Î | Ş | E | ■ | E | N | Î | ■ |
| 4 | ■ | Ç | E | L | P | ■ | S | ■ | J |
| 5 | T | ■ | K | ■ | A | B | A | D | Î |
| 6 | R | E | ■ | E | Y | ■ | N | O | ■ |
| 7 | ■ | M | E | W | Î | J | ■ | T | A |
| 8 | I | R | Q | ■ | Z | ■ | K | I | Ş |
| 9 | R | ■ | D | A | ■ | Ş | Î | N | ■ |

## Xaçepirs



### ÇEP-RAST

1. Alava ku datînin ser pişta hespan û li serê siwar dibin... Ji pêncan yek zêde
2. Pêxemberek... Beşeke malê, jor
3. Dijberê rengî spî... Bajarekî me
4. Di zimanê zarokan de lêxistin... Dengdêrên "pêça"yê
5. Kurteya elementa hesin... Plakaya navneteweyî ya Îranê... Cînava pirsê ya ku tê wateya; li kû ye?
6. Navrojê çêrandina pez heta êvarê
7. Kesê nezewicî... Kesê deng naçiyê, kesê guhê wî nabihîze
8. Cure, celeb... Cînava şexsê sisiyan ji bo rewşa netewandî... Tevgera hewayê
9. Dar yan jî hesinê datînin ser stûyê ga ku pê erebe dikişandin yan jî cot dikirin... Cama mîkroskopê

### JOR-JÊR

1. Sewaleke qirik û çîpên wê pir dirêj in... Kurtebêja zêr
2. Bi soranî 'av'
3. Têbînî... Banga ji bo nimêjê
4. Meha pêşî
5. Paytexta Sûriyê... Kesê ku rê nîşan dide
6. Nexweşiyek
7. Ji bo sekinandina ker, hesp û hestiran... Kurteya Koma Civakên Kurdistanê
8. Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyê... Qumaşê ku ji hiriyê çêdibe
9. Bersiva pejirandinê, erê... Afirandina şanoyê ya dilpêşewitîn û pêkenîn pêkve ye

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| Dad | Edalet, hiqûq, dadmendî, qanûn, zagon, yasa. Dezgehên pêşengiya qanûnan dikin |
| Dadgeh | Ciyê biryarên qanûnî lê tên dayîn. Dezgeha biryarên qanûnî. Mehkeme |
| Dadger | Rêveberê/a dadgehê. Hakim |
| Darizandin | Vekirina dozê li yekî, dayîna dadgehê, berdadkirin |
| Doz | 1. De'we, daxwaziya darizandinê. 2. Daxwazî, armanc: Doza ma azadiya Kurdistanê ye. 3. Kêşe, pirsgirêk, mesele, mûşkîle |
| Dozger | Kesê ji dadgehê daxwaziya cezakirina keseki dike. Dadpirs. |
| Mamoste | Bi taybetî kesê/a ku tiştekî fêr dike, yan jî hîna perwerde dike. |
| Parêzer | Kesê/a ku tiştekî yan keseki li dadgehê diparêze. Ebûqat, mûhamî |
| Xwendekar | Kesên karê xwendinê dikin. Bi taybetî li dibistanan. |
| Xwendevan | Kesê tiştekî dixwîne: Xwendevanên rojnameyê pir in |

# Merwanî: Em li nivîskarên girtî û berhemên wan xwedî derkevin



Ji rêveberiya PEN'a KURD nivîskar Herdem Merwanî diyar kir ku di Roja Nivîskarên Girtî ya Cîhanê de hê gelek nivîskar ji ber nivîsên xwe di girtîgehê de ne û ji her kesî xwest ku li nivîskaran û berhemên wan xwedî derkevin.

### GIRTÎGEH JI BO WÊ BÛ DIBISTAN

Merwanî ku dema 12 salî bû ji ber sedemên siyasî hat girtin û li Girtîgehê Mûş, Xarpêt, Riha, Sêwas, Êlih û Amedê ma, ji ber ku bavê wê Abdulhalîm Kirtay kesayeteke naskirî û heskirî bû, bi stiranên dengbêjên ku gelek caran dihatin mala wan, bi hunerê re eleqedar bû. Merwanî diyyar kir ku bîranînên wê yên bi Şakiro re ji ber ku gelekî piçûk bû, nayên bîra wê û wiha got: "Me hertim stiranên wî guhdar dikirin. Ez çiqas mezin bûm, min ew qas jê hez kir. Dayika min ji me re qala bîranînên me yên bi wî re dikir. Hezkirineke min a kûr ji bo wî hebû. Ji ber vê yekê min ji dengbêjiyê hez kir." Merwanî diyar kir ku dema ew ket girtîgehê berê xwe da wêjeyê û dema ciwan bû dest bi nivîsandinê kir û anî ziman ku girtîgeh ji bo wê tê wateya "dibistanê".

### HELBESTA WÊ YA EWIL: ÇÛKA AZAD

Merwanî, da zanîn ku jiyana girtîgehê ji bo wê bû cîhaneke gelek cuda û wiha berdewam kir: "Mixabin piştî ku wê demê ketim girtîgehê min derfet nedît ku dengbêjan guhdarî bikim. Hestên min ji ber tiştên ku min jiyan pir zêde bûn. Ji ber vê yekê min berê xwe da wêjeyê. Min di wêjeyê de bi helbestê dest pê kir. Di zindanê da, min mirovên ku bi rastî jî xweşik bûn û dilsozê wêjeyê bûn nas kirin. Fatma Savcı, Mizgîn Ronak çend ji wan helbestvanan e ku di girtîgehan de dest bi nivîsandina xwe kirine. Min helbesta xwe ya destpêkê bi Fatma Savcı re nivîsand. Navê helbesta me 'Çûka azad' bû . Dibe ku helbest wisa nehatibe nivîsandin, lê ev tecrubeya me ya yekem bû û me bi hev re nivîsand."

### BÊTIRS DINIVÎSIN

Merwanî, da xuyakirin ku nivîsandina wê ya helbestê jiyana wê rengîn kiriye û di helbestên wê de bandora girtîgehê heye. Mervanî, anî ziman ku hewl daye ku dema behsa girtîgehê bike ne behsa atmosfera reş û tarî bike, hesta azadî û hestiyariyê vebêje û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Jiyana zindanê bi rastî jî azadtir e. Mirov dikarin tiştên ku hîs dikin bê tirs, bê dûdilî binivîsînin. Ji ber vê yekê divê mirov jiyana zindanê wisa bibîne. Kesên di zindanê de girêdayî vê hîs û azadiyê ne."

### BI BAVÊ XWE RE DI GIRTÎGEHÊ DE MA

Merwanî, da zanîn ku sala hatibû girtin bavê wê jî hatibû girtin û 30 sal in di girtîgehê de ye. Merwanî, bi lêv kir ku girtina bavê wê bandoreke mezin li ser wê kir û wiha pê de çû: "Ez û bavê xwe bi hev re li Êlihê di girtîgehê de man û hefteyê carekê me dikarî hev bibînin. Bavê min gelek girîngî dida kurdbûnê û kurdî. Her tim li derdora wî dengbêj û stranbêj hebûn. Gelek ji hunera kurdî hez dikir. Bandora wî her tim li ser min bû. Ez di girtîgehê de jî bi bavê xwe re bûm. 2 caran hatin berdan û dîsa girtin. Bavê min jî carekê hat girtin û wisa ma. Îro jî ew girtiyekî nexweş e.

### PIRTÛKA WÊ YA EWIL HAT WINDAKIRIN

Merwanî, di heman demê de behsa zehmetiyên ku nivîskar di girtîgehan de dijîn kir û wiha domand: "Carna ji bo ku tu binivîsî pênûs û kaxiz jî nikarî bibînî. Gelek caran ji ber sirgûnan, tiştên tên nivîsandin winda dibin. Mînak min heta îro 2 pirtûk nivîsandine, pirtûka min a destpêkê ji aliyê rêveberiya girtîgehê ve hat windakirin. Lê dîsa jî tu dest ji nivîsandinê bernadî. Tevî hemû zor û zehmetiyan jî xebateke gelekî baş tê kirin."

### JI BO CIVAKÊ DINIVÎSIN

Merwanî, bi lêv kir ku her girtiyekî çîrokeke wî heye û got: "Jiyana li derve û hundir, ji bo girtiyan materyalên wêjeyî bi xwe ye. Berî ya zindanan jîyaneka hemûyan hebû. Bi pirsgirêkên xwe, bi hestên xwe di nava civakê de bûn, bi wan re eleqedar bûn. Hema bêje hemû tiştên ku hûn dinivîsin ji bo civakê ne."

### BANGA XWEDÎ DERKETINA LI BERHEMAN

Merwanî, destnîşan kir ku berhemên li girtîgehan tên afirandin li derve bê xwedî dimînin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Dema pirtûk an jî nivîs ji girtîgehan derdikevin, mijareke rexnedayînê ye ku zêde li ser nayê sekinandin. Ew pirtûk bi salan di pirtûkxaneya wêjeyî de ne. Mixabin xwedî derketinek nîne. Lê belê xwedî liv an berheman bên kirin. Em dibêjin girtîgeh wijdana civakê ne. Di vî warî de li hemberî wijdana xwe em hinekî nehesas in. Nivîskarên li derve jî çend pirtûkên nivîskarên girtî didin nasîn? Ev gelek bala min dikişîne. Van mirovan ji bo me dest ji azadiya xwe berdan. Yekane tişta ku em bikin ewe ku xwedî li wan derkevin lê gelek caran em wê jî nakin."


*MA / Ceylan Şahînlî*

## Hêza ku dagîrkeriyê bişkîne berxwedana gelên herêmê ye



Kadar Pîrê: "Dagîrkeriya tirkî ji bo gelên herêmê tavan bixeter e û wê berxwedana gel hewldanên dagîrkeran bêbandor bike." *R-4*

## Cewad El-Beydanî: Xayînên bi Tirkiyê re xeterê çêdikin û QSD li dijî planên Tirkiyê ye



Lêkolînerê iraqî Dr. Cewad El-Beydanî da zanîn ku li gel dewleta tirkî stratejiyeke kevin heye ku serweriyê li Sûriyê û Iraqê bike û vê jî bi alîkariya xayînan dike. *R-4*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 917 21-Mijdar- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Bi tabloyan xwezayê û êşa welat dide pêş



Şêwekar ew kes e ku bi firçeya xwe tebloyên bedew xêz dike û di heman demê de dîrokzan e. Çimkî bi tabloyên xwe dîrokê xêz dike. Hin şêwekaran jî firçeya xwe xistiye xizmeta mirovayiyê. Yek ji wan şêwekaran Rehîmo ye. *R-7*

# 'Rêber APO gelekî qehreman û berxwedêr afirand'

Bi armanca têkbirina vîna gelê Kurd û gelên Rojhilata Navî, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, 15'ê Sibata 1999'an bi komployeke navneteweyî dîl hat girtin û ji aliyê hêzên kompoger û radestî dewleta tirkî ya faşîst hat kirin. Ev 23 sal in Rêber Apo li Girava Îmralî di tecrîdeke pir giran de ye. Ev çend sal in dagîrkeriya tirkî nahêle parêzer û malbat bibînin. Dewleta dagîrker di kesayeta Rêber Apo de, gelên azadîxwaz dike amanc. R-5



## `Emê rojên salê tevan bikin rojên têkoşîna jinê`



Mûna Yûsiv: Bi nêzîkbûna rasthatina 25ê Mijdarê em jinên bakûr û rojhilatê Sûriyê vedixwînin vê têkoşînê. Divê li hemberî sûcên derbarê jinê de em hê pirtir xwe bi rêxistin bikin û têkoşîna xwe xurttir bikin." *R-5*

## Emîneya kartonan kom dike li hemberî qeyranê têdikoşe



Emîne Çarkici ji bo li 4 zarokên xwe û hevjînê xwe yê ku nexweş e binêre kartonan kom dike, karê paqijiyê dike û geştiyaran digerîne. Emîneya bê rawestan dixebite dibêje, ez her roj difikirim ka çawa zarokên xwe têr bikim. *R-2*

## Konferansa malbatên şehîdan yên Tirbespiyê hat lidarxistin



Meclisa Malbatên Şehîdan ya Tirbespiyê konferansa xwe ya 7an bi beşdariya malbatên şehîdan û şandeyan li dar xist û bi hilbijartina rêveberiyeke nû ji bo meclisê bi dawî kir. *R-3*

# Riya azadiyê di felsefeya Ocalan de ye

**Jinên Qamişlo: Bi tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan, dagîrker dixwazin vîna gelê Kurd bişkînin. Lewra gelê Kurd û gelên cîhanê yên bindest fikir û felsefeya Rêber Apo ji xwe re dikin bingeh û bi wê hişmendiyê xwe dikin xwedîvîn.**

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**





Li ser siyaseta dewleta tikrî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan jinên bajarê Qamişlo helwesta xwe diyar kirin.
Têkildarî mijarê ji rêveberiya Kongreya Star ya taxa Hilêliyê Salha Keleş ev nirxandin kir: "Em tecrîda li ser Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar dikin. Rêber Apo ne serokê Kurdan tenê ye, di roja me ya îro de bi milyonan kes wî nûnerê xwe dibînin û li ser fikir û felsefeya wî têdikoşin. Xwesteka dewleta tirkî ya dagîrker tinekirina rêbertiya me ye. Ev 23 sal in Rêber Apo di girtîgehê de ye. Ji bo misogerkirina azadî û hebûna Kurdan berxwedanke mezin dike. Bi ked û xebata xwe, ji bo gelê li ber tinebûnê jiyaneke nû afirand. Me bi wî û felsefeya wî xwe nas kir. Jina Kurd ku tine dihat dîtin, bi saya rêbertiyê îro xwedîmaf e û li her qada jiyanê kar dike.
Salha Keleş axaftina xwe wiha qedand: "Ev tcerîd ne li ser rêbertiya me tenê ye, li ser gelên Rojhilata Navî tevan e. Rast e Rêbe Apo bi bedena xwe di zindanê de ye, lê bi fikir û ramana xwe di nava me de ye û bi milyonan Ocalan gihandine. Azadiya Rêber Apo azadiya gelên Rojhilata Navî tevan e.
Endama Saziya Malbatê Şehîdan Delal Bedûr jî ev nirxandin kir: "Em dizanin ku tecrîda li ser Rêber APO dewama komploya navneteweyî ye. Rêberekî weke Abdullah Ocalan ku ji bo mirovayiyê tevê dixebite û têdikoşe, nabe dîlgîrtiyê faşîzmê be"
Delal Bedûr diyar kir ku dewleta tirkî dixwaze di şexsê Rêber Apo de, bi faşîzmê mirovayiyê tine bike. Bi vê dixwaze di nava gelê Kurd de tirsê çêke û îradeya wî bişkêne. Herwiha têkiliyên xurt, yên di navbera gel û Rêberê wî de qut bike û moralê wan lewaz bike. Gelê me jî divê bersiva vê bide û rojane dakeve qadan; çalakî û xwepêşandana bike. Heta em azadiya Rêber APO bi dest nexin, divê em li ser piyan bin. Divê dewletên cîhanê jî derbarê tecrîda li ser Rêber Ocalan de bêdeng nemînin û erkê xwe pêk bînin. Em bêdengiya wan şermezar dikin."

# Bi têkoşînê pêşiya şidetê bigirin û jiyana hevbeş ava bikin

**Jiyan Ebas-Qamişlo**

**Bi pêmana 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Şideta li ser Jinan, jinên bajarê Qamişlo hest û nêrînên xwe diyar kirin û gotin, wê jin li Rojava û bakur û rojhilatê Sûriyê di her qada jiyanê de li dijî hişmendiya desthilatdar têkoşînê xurt bikin û ne rojekê her roj bikin roja têkoşîna li hemberî şidetê.**



**BÊMAFÎ ŞIDETA HERÎ GİRAN E**

Li ser mijarê jina bi navê Rojda Ferhan diyar kir ku dema behsa zor û şidetê tê kirin, destpêkê lêdan tê bîra mirovan, lê di serî de bêmafî şidet e û got, dema mêr rêbaza zorê li ser jin û zarokan bi kar tîne, dixweze lewaziya xwe veşêre. Lê jin bi vîn û îradeya xwe ya azad dikarin rê li şideta mêr bigirin.

**Bİ TÊKOŞÎN Û BERXWEDANÊ ŞIDET TiNE DİBE**

Rojda da zanîn ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo azadiya jinê xwediyê têkoşîneke mezin e ku jin ji tarîtiyê derxist ronahiyê û wiha axivî: "Ji ber wê em dibêjin tecrîda li ser Rêber Apo tecrîda li ser tevayiya jinane."
Rojda herwiha da xuyakirin ku di dîrokê de jinê di du eniyan de (şerê hişmendiyê û şerê çekdarî) têkoşîn kiriye û wiha got: "Mînaka wê jî YPJ ye. Bi berxwedana xwe ya li hemberî çeteyên DAIŞ'ê û hişmendiya tarî şer kir û ji bo jinan tevan bû hêviya azadiyê. Ji ber wê em dibêjin, em jinên Rojava û bakur û rojhilatê Sûriyê emê bi pêşengiya YPJ'ê têkoşîna ji bo azadiya jinan bidomînin û tevayiya jinan azad bikin."

**EMÊ ZORA MÊR Bİ PERWERDEYÊ BIŞKÎNIN**

Jina bi navê Leyla Hisên jî diyar kir ku 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna Cîhanê ya li hemberî şideta li ser jinan e û got, bi hezarê salan e ku her rengê şidetê li jênan tê kirin. Ji bo ku jin bikarin pêşiya vê zorê bigirin, divê berî her tiştî xwe perwerde bikin. Emê bi perwerdeyê xwe zana bikin û li dijî her rengê zorê bibin xwedîhelwestl.
Leyla bi van gotinan axaftina xwe qedand: "Heta ku jin azad nebe mirov nikare behsa civakeke azad bike. Lewra bingehê civaka azad jina azad e û zora li ser jinan ji bo têkbirina civakê ye. Şkandina zor û şidetê û azadkirina civakê jî bi jina perwerdekirî, zana û azad dinbe."



# Emîneya kartonan kom dike li hemberî qeyranê têdikoşe

**Emîne Çarkici ji bo li 4 zarokên xwe û hevjînê xwe yê ku nexweş e binêre kartonan kom dike, karê paqijiyê dike û geştiyaran digerîne. Emîneya bê rawestan dixebite dibêje, ez her roj difikirim ka çawa zarokên xwe têr bikim.**

Ji ber polîtîkayên şaş yên desthilata AKP-MHP'ê, qeyrana aborîyê kûr dibe û welatî xizantir dibin. Êdî jimara kesên li kolanan jarton, bermayî û laylonan kom dike zêdetir dibe. Ji wê zêdetir di vê pêvajoyê de pêkan e ku em rastî kesên li kolanan radikivin jî werin. Emîne Çarkici (46) ya li Mêrdîna kevin, li kuçeya Bazarê bi malbata xwe re dijî ji bo debara malbata xwe û hevjînê xwe yê ku nexweş e bike karton û bermayiyan kom dike. Di nava qeyrana heyî de Emîneyê têkoşînek mezin a jiyanê dide. Ji bo bi hezaran xizanên li Tirkiyeyê û herêmê **ew nimûneyek in.**

Di sîstemek nîjadperest û zayendperest de dema mirov jin be bi serê xwe pirsgirêkek mezin e. Ger tu nîştecihê herêma kurdan bî, jin bî û xizan bî ji bo te jiyan qat bi qat zehmetir dikeve. Di aliyê dîtina kar de zehmetiyan dibîne û di çi karî de bixebitin jî rastî mobîng û bişaftinê tên. Li rex vê yekê jî em li jinek ku li hemberî hemû qeyranên siyasî, civakî û aborî karê kolanan dike û bermayan kom dike temaşe bikin. Ew hem rastiya Tirkiyeyê ne û nîşaneya têkoşîna jinê ye.

**24 saetên Emîneyê bi kar derbas dibin**

Her ku diçe qeyran kûrtir dibe û jimara xizanan zêde dibe. Weke gelek nîştecih dibêjin jî xizan xizantir û dewlemend jî dewlementir bûn. Bi kurtasî sîstem ji dewlemendan re xebitî. Weke me di serî de jî me nîşan kir li her kuçeyê pêkan e ku em jin û zarokên ku bi bermayan debara xwe dikin ango li kolanan radikevin bibînin. Emîne Çekîcî jî yek ji wan jina ne ku li Mêrdîna kevin kuçe bi kuçe digere û ji bo debara xwe bike her karî dike. Dayika 4 zarokan e. Hevjînê wê jî nexweş e. Ew beriya zarok rabin li kolanan bermayan kom dike û tê malê xwarina wan amade dike. Piştî paqijiya malê û lênêrîna hevjînê xwe ew cardin derdikeve kolanan. Ger karê paqijiya malan hebe, paqijiyê dike. Ger tune be jî geştiyaran digerîne yan jî qartonan kom dike. Dema xwarina firavînê xwe digihîne malê. Ev tim wisa berdewam dike. Ji bo zarokên xwe û hevjînê xwe jî îhmal neke bi rêk û pêk tev digere.

**'Min tiştekî nebaş û parsekî nekiriye'**

Gelek jinên weke Emîneyê hene. Lê ji ber zextên sîyasî û civakî nikarin biaxivin. Zêdetirînê wan xwe dinixûmînin jî. Dema em Emîneyê dişopînin jî em dibin şahidê gotinên çewt ên kesan û henekên zarokan ên li dijî wê. Ew li ser vê yekê ji me re dibêje:"Ez li cihê 10 mêran dixebitim, heta niha min tiştekî nebaş û parsekî nekiriye. Min nehiştiye zarokên min jî mihtacê kesî bibin. Ên ku tiştekî nebaş bêjin jî şerm û gunehê wan e."



**'Her tişt ewqas biha bûye'**

Emîneyê di nava têkoşînek mezin de ye. Lewra ew ji vê rewşê gilîdar e. Ruxmê jiyana wê hemû kar e jî nikare debara xwe bike. Ew dibêje ez bi bermayên xelkê cilan li xwe û zarokên xwe dikim û wiha berdewam dike:"Em di nava xizaniyê de hatin dinê lê her ku diçe em lûtkeya xizaniyê dibînin. Her roj ez a xirabtir dijîm. Ez carek bikaribim kîraya xaniyê xwe bidim, ez ji wê rojê de dikevim fikara meha were ez ê çawa bidim. Ez ê çawa zarokên xwe îro jî têr bikim ez difikirim. Ango ez ne tenê destên xwe û lingên xwe bi kar tînim. Ez tim di fikaran de me. Her tişt ewqas biha bûye ku ez bawer im ne ez tenê gelek kes weke min hene."
***MA-Medya Uren***



# HRRKê `şervanên ziman û dîroka kurdî` xelat kirin

**HRRKê, ked û xebata Salihê Heydo û Konê Reş ya di warê wêje, ziman û dîroka kurdî de bi Xelata HRRKê ya Afirandinê pîroz kir.**

**Serbest Etê/Qamişlo**

18ê Mijdarê li Qamişlo bi konfernseke rojnamevanî ya li navenda Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) piştî gotûbêjên berifireh Komîteya Kargêr ya Hevgirtinê `Xelata HRRKê Ya Afirandinê` ya salane pêşkêşî Salihê Heydo û Konê Reş kir.
Salihê Heydo û Konê Reş ku du nivîskar û lêkolînerên in û xwediyên ked û xebateke pir mezin in, di warê wêje, çand, ziman û dîroka kurdî de, ji aliyê HRRKê ve wek şervanên ziman û dîroka kurdî hatin binavkirin.
Herwiha HRRKê tevî xelatê, ji bo keda wan ya berfirhkirina asoyê zaravayê kurmancî ji Salihê Heydo û Konê re hêviya serkeftinê xwest.
Çawa ku tê zanîn Salihê Heydo û Konê Reş du nivîskar û lêkolînerên çand, wêje û dîroka kurdî yên rojavayê Kurdistanê ne û xwediyên bi dehan pirtûk û berhemên wêjeyî û dîrokî ne.
Hêjayî gotinê ye ku ` Xelata HRRKê Ya Afirandinê` ya salane ji 2016an ve dest pê kiriye û heta niha didome. Ev xelata çaran e ku pêşkêşî afirîner û xebatkarên wêje û çanda kurdî li Rojava dibe. Xelata HRRKê ji mertal û 1000 dolarê Amerêkî pêk tê.




# Bi tabloyan xwezayê û êşa welat dide pêş

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**Şêwekar ew kes e ku bi firçeya xwe tebloyên bedew xêz dike û di heman demê de dîrokzan e. Çimkî bi tabloyên xwe dîrokê xêz dike. Hin şêwekaran jî firçeya xwe xistiye xizmeta mirovayiyê. Yek ji wan şêwekaran Rehîmo ye.**

Rehîmo Hisên ku şêwekarekî Kurd e, sala 1962yan, li bajarê Amûdê ji dayîk dibe. Di heft saliya xwe de ji xêzkirinê hes dike û dest pê dike. Bi piştgiriya mamosteyên xwe û malbatê pirtir balê dide ser xêzkirinê. Di 12 saliya xwe de arme û reklamên dikanan xêz dike û difroşe. Bi wan pereyan amûrên xêzkirinê dikire. Herwiha wêneyên Cegerxwîn, Che Gîvara, Lênîn û navdarên cîhanê yên din xêz dike. Di 17 saliya xwe de wêneyekî Cegerxwîn bi risas xêz dike. Wê demê partiya Pêşverû jê dixwaze û diyarî wan dike. Heta niha çalakiyên ji bo bîranîna Cergerxwîn tên lidarxistin, ew wêne jî tê daleqandin.

**DEMA REJIM DESTHILATDAR BE WELATPARÊZÎ DIBE SÛC**

Rehîmo piştî ku xwendina seretayî diqedîne ji bo xwendina fakûlteya hunerî beşa şêwekariyê berê xwe dide Şamê. Ji zanîngehê li seranserê Sûryê dibe yê duduyan. Wê demê rejimê kesên serleftî ji bo mastir dişandin Ewropa. Lê ji ber fikrê Rehîmo yê kurdewarî rejim wî naşîne.



Derbarê kar û xebata siyasî de Rehîmo wiha axivî: "Destpêkê min li bajarê Amûdê Koma Serxwebûn ava kir. Demeke baş di beşa şano de min kar kir. Piştî ku çûm Şamê min li cem rewşbîrên doza kurdî dikirin kar kir. Min û hevalên xwe me gelek şahiyên Newrozê li dar dixistin. Ji ber ku ez û gelek hevalên xwe li zanîngehê û cihên giştî bi zimanê kurdî diaxivîn, 30 hevalên min ji Amûdê, Qamişlo, Şam û Helebê ji aliyê rêjima Be`es ve hatin girtin. Herwiha ji aliyê rejimê ve min gelek astengî dîtin. Ji bo domandina xebata xwe neçar mam ji Sûriyê derkevim."
Piştî ku Rehîmo diçe Ewropa li Belçîka ji bilî karê şêwekariyê di peymangeha zimanê Kurdî de jî kar dike. Sala 2005an ew û hevalê xwe Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê ava dikin. Bi awayekî fermî 25 salan li Belçîka nameyên girtiyên Kurd yê di girtîgehên Ewropa de digihîne Komîteya Dadgeha Ewropa. Sala 2015an di rêvberiya civînên opozisyona Sûriyê de ciyê xwe digire. Piştî wê dev ji karê siyasî berdide û bi bi karê şêwekariyê tenê ve mijûl dibe.

**LI WELATÊ XERÎBIYÊ TABLOYÊN RENG Û XWEZAYA WELATÊ XWE XÊZ DIKE**

Rehîmo li ser şêwekariya li Ewropa jî wiha axiv: "Li Belçîka şêwekarî di asteke bilind û pêşketî ye. Herwiha tabloyên xêz dikin wêneyên wan ji yên em xêz dikin cudatir in. Min dikariya weke wan tabloyan xêz bikim, lê min xwest teboloyên kurdî xêz bikim. Li mala min odeyeke taybet ji bo xêzkirinê heye. Dema xêz dikim li stiranên kurdî guhdarî dikim, li wêneyên xwezaya Kurdistanê temaşe dikim, perdeyên bi neqşên kurdî di hidirê malan de tên bîra min. Ji ber wê kesên li tabloyên min temaşe bikin wê bizanin ku êwekarekî Kurd im. Min li Almanya, Belçîka û Sûriyê pêşangeh vekirin. Herwiha min heşt salan ji bo Med Tv û Medya Tv dekor çêkirin."
Rehîmo diyar kir ku sala 2020an pêşangehek vekiriye. Tabloyên pêşangehê jî tev li ser şewata sînemaya Amûdî bûn. Di pêşangehê de bi nivîsekê diyar dike ka sînema çawa şewitiye û çend rojan bêhna goştê zarokan yên şewitîn li bajar belav bûbû. Kesên li bûyera sînemayê temaşe dikin dixwazin heman pêşangeh li mûzeya Brûkselê jî bê nîşandan.
Şêwekarên tevlî Komxebata HRRKê ya Şêwekariyê ku ji 8 heta 15ê Mijdarê dewam kir, Rehîmo jî yek ji wan bû û têkildarî tabloya xwe ya di komxebatê de xêz kirî wiha axivî: "Tabloya min xêz kirî wêneyê Fatima Salih Axa ye. Min xeyalên xwe ji stirana Rifetê Darî girtine û xêz kiriye. Min dixwest çîroka heskrina kurdî derxim pêş. Herwiha pir kêfxweş bûm ku komxebatên wiha li welatê me tên lidarxistin. Bi hêvî me çalakiyên wiha dewam bin. Herwiha dixwazim bi riya rojnameya we peyamekê bigihînim gelê Kurd ku bixwînin. Xwendin bingehê avakirina welatan e. Emê bi zanist û xwendinê bi ser bikevin"

# Dewlet destpêkê êrişî ziman dike

**Zext û zora li ser ziman û wêjeya kurdî bi awayekî sîstematîk didomin.**

Zextên li ser ziman û wêjeya Kurdî bi awayekî sîstematîk didomin. Herî dawî ji ber Kurdî, konsera Navenda Çandê ya Mezopotamyayê (NÇM) û konsera hunermend Mem Ararat hatin betalkirin.
Hevserokê Komeleya Ziman û Çandê ya Birca Belek, Mîrza Ronî, bal bire ser zextên li ser Kurdî û got, ji bo astengî li ber wan neyên danîn, divê ew li ber zextên li ser zimanê K-urdî rabin.
Ziman hebûna gel e
Mîrza Ronî got, têkoşîna gelê Kurd a ji bo çand û zimanê xwe têkoşîna hebûnê ye û dewlet jî bi sedan sal e bi qanûnên xwe yên hişk û tekparêz hewl dide hebûna Kurdan qedexe bike. Mîrza Ronî anî ziman ku di têkoşîna gelê Kurd a ji bo mafên xwe yên mirovî de dewlet ewilî êrişê dibe ser Kurdî: "Ji ber ku ziman hebûna gel e. Lewma ewilî êrişê dibe ser zimanê Kurdî û dixwaze wî tine bike."
Mîrza Ronî bi bîr xist ku di qanûn û destûrên dewleta Tirk de Kurdî her tine û wiha peyivî: "Li hepsan, li edliyeyan û li saziyên fermî Kurdî qedexe ye. Berê li gelek deveran digotin, 'zimanekî nayê nasîn' û qedexe dikirin. Kurdan bi têkoşîneke mezin ev ziman bi wan da qebûlkirin. Lê niha jî li edliyeyan dibêje, 'ez nizanim, bila wergêr were.' Ji bo mirov doza wergêr nekin jî berdêleke mezin a aborî didin ber wan."
Xwedîderketina li ziman qels e
Mîrza Ronî, bal bire ser qedexekirina konserên NÇM'ê û hunermend Mem Ararat û bang li her kesî kir da ku xwedî li van konseran derkevin: "Niha xwedîderketina me ya li ziman qels e. Erê xwedîderketin heye, lê ev ne bes e. Divê kes nebêje, 'zimanê min qedexe ye, nikarim xwedî lê derkevim.' Divê her kes li ber biryara qedexekirina konseran rabe. Divê em li ber qedexeyên li ser qenalên me, sazî û dezgehên me rabin. Divê em li ber van astengî û qedexeyan rabin ku kes nikaribe sînoran deyne ber me."



**MA**

# Azadiya gelan bi xwîna şehîdan tê afirandin

Afirînerên vîna azad şehîd in. Kesên di dereceya yekê de li welat û gelê xwe xwedî derketîn şehîd in. Herwisa bi saya vîn, berxwedan û têkoşîna şehîdan azadiya gelan tê afirandin.

**Hediya HISÊN-Qamişlo**








Ji bo jiyaneke birûmet û û rizgariya welatê me berdelên giranbiha hatin dayîn û hê jî tên dayîn. Zarokên agir û rojê bêdudilî canê xwe kirin goriyên azadiyê. Ji bo azadiya Kurdistanê, bi dehhezaran zaroyên Kurdan şehîd bûne û yek ji wan şehîd Zinar e.

Zinar Ebdirezaq 19ê Adara 1996an li bajarê Qamişlo, di malbateke welatperwer de ji dayîk dibe. Nexriyê dayîka xwe ye. Kesayeteke dilpak û jîr e. Ji zaroktiya xwe ve Tevgere Azadiya Kurdisatê nas dike û pir jê hes dike. Ji xwendina xwe jî pir hes dike, lê sala 2011an destpêka şerê li Sûriyê, ji ber nijadperestiya maomsteyên rejimê ya li dijî xwendekarên Kurd xwendina di nîvî de dihêle. Ji tembûrê û stiranan pir hes dike û stiranan dibêje. Sala 2012an tevlî refên YPG Dibe. Piştî du salan tevlî Ciwanên Şoreşger dibe û ciwanan bi rêxistin dike. Di dema êrişa DAIŞê ya ser Şingalê de, ew jî di nava ciwanan de tevlî şer dibe. 19ê Tebaxa 2014an li Ceza şehîd dibe.

Derbarê mijarê de bavê şehîd Zinar, Idrîs Ebdirezaq diyar kir ku destpêka damezirandina Hêzên Parastina Gel (YPG)ê Zinar tevlî bû û axaftina xwe wiha domand: Me jî biryara wî erênî dît û pîroz kir. Dema vedigeriya malê jî kar dikir. Ji zarok û ciwanên taxê re, behsa Tevgera Azadiyê û şoreşa Rojava dikir. Piştî xebata du salan ya di nava xiwanan de, di dema êrişa DAIŞê ya ser Şingalê de biryara çûna Şingalê da. Digot, keç û jinên me li bazaran tên firotin, ezê ji bo rizgarkirina wan biçim. Piştî Şingalê vedigere Ceza û tevlî şerê li dijî DAIŞê dibe. Di şerê li Ceza de şehîd dibe."

Derbarê şehadeta Zinar de, Ebdilrezaq wiha Got: "Mirin tehl e, lê şehadet pîroz e. Şehadeta kurê min cihê serbilindiyê ye. Ez şehadeta wî li tevayiya gelê Kurd pîroz dikim. Heta dawiyê emê li dû şopa wî bin. Herwiha ji bo azadiya gel û Rêber Apo emê bi tevger bin û têkoşîna xwe bikin."

Metika şehîd Zinar, Intîsar Ebdulrezaq jî wiha Axivî: "Zinar kesayeteke bi temenê xwe piçûk bû, lê bi mejî û fikrê xwe mezin bû. Di her qada jiyanê de cihê xwe çêdikir û cihê wî xuya bû. alîkariya her kesî dikir. Pir girêdayî hevalên xwe bû. Ez û wî bi hev re fêrî saz û tembûrê dibûn. Piştî şehadeta wî hevalên wî her dem dihatin mala wan. Her sal jî bîranîna wî tê lidarxistin.

# Li paşroja zarokan xwedî derkevin

**Darîn Silê/Qamişlo**

**Zarok firîşteyên jiyana mirovayiyê û paşroja welatê xwe ne. Her civak bi zarokên xwe ava dibe. Herwiha ji bo parastina mafê zarokan sala 1925`an Roja Zarokan Ya Cîhanê hat ragihandin**

Derbarê mijarê de rêvebera navenda cîhana zarokan ya zarokên pêdiviyên taybet Şêrîn Elî Roja Zarokan Ya Cîhanê li tevayiya zarokên cîhanê bi taybetî li zarokên ku ketine bin işkenceyê pîroz kir û wiha got: "Her sal 20`ê Mijdarê cejna zarokan li tevayiya cîhanê tê pîrozkirin. Ev roj ji bo zarokan hatiye veqetandin, da ku her kes nirxê zarokan bizane û mafê wan bi dest bixe. Zarok paşroja welatê me ne, dema em li zarokên xwe xwedî derkevin, em li welatê xwe jî xwedî derdikevin. Ji bo wê divê em li zarokên xwe xwedî derkevin. Bi taybetî zarokên me yên rojavayê Kurdistanê. Lewra di rewşa şer de derbas dibin. Gelek ji wan zor û zehmetiyên jiyanê dikşînin û zaroktiya xwe nabînin. Herwiha di nava şer de gelek zarokan dê û bavê xwe winda kirine û rastî êrişan hatine. Ev tev dibin sedem ku zarok ji jiyana zaroktiyê qut bibe. Çimkî di vê rewşê de herî zêde bandor li zarokan dibe. Di van salên dawî de ji ber êrişên dewleta tirkî ya dagîrker gelek malbat neçarî koçberiyê bûn û zarokên wan jî jixwendinê dûr ketin."

Şêrîn da zanîn ku herî zêde zarok bi dê ve girêdayî ne û axaftina wiha domand: "Di malê de piranî zarok bi diya xwe ve girêdayî ne. Ji bo wî divê dê bizane ka çawa danûstandinê bi zarokên xwe re bike, da li ser bingehekî baş û rast mezin bibin. Bi taybetî zarokên pêdiviyên taybet divê malbat tev bi wan re alîkar be. Divê danûstandina bi wan re bi rengekî cuda be. Herwiha divê fêrî derdorê bibin û mafê wan weke her zaok were bidest xistin."



Şêrîn got, hin tişt zirerê didin jiyana zarokan û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Tişta ku herî zêde bandorê li zarokan dike û mejiyê wan xirab dike înternêt e. Çimkî bi înternê zarok fêrî gelek tiştên ne baş dibin. Di encamê de fikrê wan tê guhetin û asta zaroktiyê derbas dikin. Gelek zarok ji ber înternêt ji civaka xwe qut dibin û dûrî malbata xwe jî dikevin, çimkî dema zarok fêrî înternêtê dibe pê ve tê girêdan. Ji bo wê jî divê malbat hay ji zarokên xwe hebin û nehêlin ku zarokên wan înternêtê weke lîstokekê bi kar bînin."

Şêrîn Elî axaftina xwe wiha qedand: "Wek navenda cîhana zarokan em her sal di roja zarokan ya cîhanî de şahiyê ji zarokan re li dar dixin û perwerdeyên derbarê parastina mafê zarokan didin. Herwiha em hewil didin ku hin projeyên girêdayî zarokan çêkin, da ku zarokên me yên bakur û rojhilatê Sûriyê ji rewşa şer derkevin û xweşî bikeve dilê wan. Em bang li rêxistinên ku dibêjin em parastina mafê zarokan e dikin ku bi me re bibin alîkar da em bi hev re mafê zarokên xwe biparêzin û paşrojeke baş û bê zor û zehmetî ji wan re bidest bixin."

# Desteya Rêveberiyên Herêmî û Jîngehê projeyên stratejîk pêk anîn



**Desteya Rêveberiyên Herêmî û Jîngehê xebatên projeyên xizmetguzarî yên sala 2021`ê qedandin.**

Desteya Rêveberiyên Herêmî û Jîngehê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê piştî ku budce diyar kir û li deste û komîteyên rêveberiyên herêmî belav kirin, amadekariyan dike da ku dest bi pêkanîna projeyên xizmetguzarî yên nû li herêmê bike.

### PROJEYÊN STARTEJÎK PÊK HATIN

Têkildarî mijarê cîgira Hevseroka Desteya Rêveberiyên Herêmî û Jîngehê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Medya Bozan got: "Desteyê projeya qîrkirina rêya Reqa-Hesekê, pêk anî. Niha qîrkirin di pêngavên xwe yên dawîn de ye. Li Tebqayê rêya El-Firûsiyê -Bendava Tişrînê jî zift kir. Her wiha li gorî standarên Sûriyê, parzûngehek ji bo çêkirina madeya bitumen ya ron ava kir."

Desteya Rêveberiya Herêmî û Şaredariyan budçeyek veqetand û li deste û komîteyên rêveberiya herêmî û şaredariyan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav kir. Li gorî berpirsan di belavkirinê de rûbera erdnîgarî û zêdebûna nifûsan li her herêmekê, her wiha herêmên ku ji ber şer zerar dîtine weke Dêrazor, Tebqa, Reqa û Minbicê, di ber çavan re hatine derbaskirin.

### PÊŞKETINEKE BER ÇAV JI ALIYÊ XIZMETGUZARÎ VE Û JI SEDÎ 70`Î PROJE PÊK HATINE

Têkildarî rewşa xizmetguzarî li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Medya Bozan destnîşan kir ku herêmê di demên dawî de hatine rizgarkirin, rewşa xizmetguzarî li wir di warên av, toreyên kanalîzasyonê, aloziya nan, zêdebûna qezayên trafîkê ji ber nebaşbûna rêyan ji zehmetiyên ku li pêşiya desteyê derketine.

Medya Bozan daxuyand ku di demeke kurt de desteyê zehmetî derbas kirin û ji sedî 70`î projeyên ku xistibûn nava planên xwe, pêk anîn.

Li gorî salên borî di 2021`an de projeyên girêdayî firehkirina toreyên avê, nûkirina toreyan û qîrkirina hin rêyên girîng di nava bajar de, hatin kirin.

### PLANÊN DESTEYÊ

Medya Bozan planên pêşerojê û projeyên stratejîk ên dê di sala 2022`an de pêk werin, eşkere kir. Her wiha teqez kir ku wê girîngî bidin ziftkirina rêyên di navbera bajar û rêveberiyan de.

Medya Bozan wiha domand: "Her wiha teqîgehên hawîrdorê hatin vekirin. Pireya El-Sehlebiye û Reqa El-Semra hatin sererastkirin. Rêya Qamişlo-Dêrik li herêma Cizîrê hatiye qîrkirin. Rêya Til El-Semin-Hezîma- Reqa û rêya bendava Firatê û Bîra Sinah li Tebqayê hatin qîrkirin."

Têkildarî pêşketina kar di demên pêş de ji wan derxistina qanûna cezakirina avakirinê Medya got: "Şêniyan ji vê biryarê kêfxweş in, em jê armanc dikin ku sînor ji avakirina bêserûber re bê dayîn."

Di demên dawîn de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê diyardeya kombûna çopê ne li cihên wê, derketiye holê û ji bo vê yekê jî desteyê reşnivîsa qanûna parastina jîngehê derxist.

***ANHA***



# Konferansa malbatên şehîdan yên Tirbespiyê hat lidarxistin

Meclisa Malbatên Şehîdan ya Tirbespiyê konferansa xwe ya 7an bi beşdariya malbatên şehîdan û şandeyan li dar xist û bi hilbijartina rêveberiyeke nû ji bo meclisê bi dawî kir.

Konferansa 7. Ya Meclisa Malbatên Şehîdan ya Tirbespiyê bi dirûşma"Bi şerê gel yê şoreşgerî emê faşîzima dewleta tirkî û dagîrkeriyê têk bibin" li dar ket. Di konferansê de 210 delge, şandeyên ji QSD, YPJ, YPG, Mala Êzidî ya Tirbespiyê, nûnerên ji partiyên siyasî û saziyên Rêveberiya Xweser a Demokratîk amade bûn.

Xebatên konferansê bi deqeyeke rêzgirtinê dest pê kir, dûvre Zeyneb dayika şehîd Simko, Mihemed û Gêlan axivî û lidarxistina konferansê li tevahî gelên herêm ji Kurd, Ereb û Suryan pîroz kir û hêviya serkeftinê xwest.

Dûvre endama rêveber a Kongreya Star Mecdolîn Elî, endamê rêveber ê Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Fesîh Hisên û yek ji fermandarên QSD'ê Zêdan Elî axivîn û lidarxistina konferansê li tevahî malbatên şehîdan pîroz kir û da zanîn ku malbatên şehîdan xwedî erka pêkanîna aştî û azadiya civakê ne û pêşengê têkoşîn û berxwedanê ne.

Axêveran diyar kir ku dagirkeriya Tirk hewl da û hîna hewl dide destkeftiyên şehîdan têk bibe, her wiha bang kir ku hevgirtî bin da ku parastina destkeftî û armancên şehîdan bikin.

Piştre rapora salane ya Meclisa Malbatên Şehîdan bi zimanên kurdî û erebî hat xwendin, deriyê nîqaş û nêrînan û nirxandina xebatên salên borî hat vekirin, her wiha pêşniyarên ji bo xebata meclisê di pêşerojê de hatin kirin

Dûvre rêveberiyeke nû ji bo Meclisa Malbatên Şehîdan a Tirbespiyê ku ji 9 endaman pêk tê hat hilbijartin.

Konferans bi gelek biryaran bi dawî bû:

-Ji bo azadiya rêber Apo têkoşîn were xurtkirin.

-Tevahî pirsgirêkên malbatên şehîdan bêyî derengxistin bi rêya Meclisa Malbatên Şehîdan werin çareserkirin, were xwestin dê komîte ji bo vê yekê werin avakirin.

-Divê Meclisa Malbatên Şehîdan di nav malbatên şehîdan û civakê de saziya pêşeng be.

-Ji bo şopandina rêxistinbûyîna malbatên şehîdan û diyarkirina erk û peywiran di saziyê de komîteyeke taybet were avakirin.

-Xebatên perwerdeyê di Meclisa Malbatên Şehîdan de were domandin.

-Divê Meclisa Malbatên Şehîdan li hemberî êrişên li ser nirxên şehîdan û felsfeya rêbertiyê bisekine.

-Ji bo pêşxistina xebatê, divê Meclisa Malbatên Şehîdan bi hemû saziyan re koordîne bike.

-Divê Meclisa Malbatên Şehîdan, li ser pirsgirêkên diravî û aborî yên malbatên şehîdan bisekine û li gorî derfetên heyî projeyên aborî veke.

-Divê Meclisa Malbatên Şehîdan pêşengtiya civakê di rêxistinkirina gelê şoreşger li ser fikir û felsfeya rêbertî de bike.

***ANHA***




# Çalakiya li Sêmalka di roja 48'an de dewam dike



**Yekîtiya Cotkaran ya Herêma Cizîrê helwesta PDK'ê şermezar kir ku cenazeyên şehîdan radestî malbatên wan nake.**

Çalakiya konvedanê ya li deriyê Sêmalkayê ya bi daxwaza cenazeyên gerîla Tolhildan Raman û Serdem Cûdî yên ku li herêma Xelîlfanê di kemîna hêzên PDK'ê de şehîd bûne, di roja 48 an de berdewam dike.

Endamên Yekitiya Cotkaran û Berhemên Sewalkariyê ya Herêma Cizîrê li qada deriyê Sêmalkayê kom bûn û bi diruşmeyên silavkirina berxwedana gerîla û şermezarkirina xiyaneta PDK'ê ve ber bi deriyê Pêşxabûr ve meşiyan.

Meş li deriyê Pêşxabûr rawestiya û ji bo bîranîna cangoriyên azadiyê deqeyeke rêz hate girtin. Bi navê Yekitiya Cotkaran û Berhemên Sewalan a Kantona Hesekê, endamê reverb ê yekitiyê Mihemed Hemîd daxuyanî xwend.

Di daxuyaniyê de hate gotin: " Kombûna me ya li vê qadê ji bo piştgirî û dilo-ziya bi xeta şehîdan re ye. Her wiha ji bo ku em dengê xwe bilind bikin da ku cenazeyên şehîdên xwe yên leheng ên ku bi destê xayînan şehîd bûne, werbigirin. Ji vir em banga raya giştî û rêxistinên mirovî û Xaça Sor a Navneteweyî û Desteya Neteweyên Yekbûyî dikin da ku ji bo vî karê mirovî destwerdanê bikin.

Çalakî ket roja xwe ya 48'an. Ma dem nehat ku ew alî qêrîna bi şewat a dayikan bibhîzin? Kanî mirovahî ya ku heya niha guhdar nake? Gelo ma ev ne mafê ye? sekna me ji bo muxatebgirtina wijdanê mirovan e ku divê bangên me bibersivîne û bêdengiya xwe û zilmê bişkîne

Wê şênî çalakiya xwe berdewam bikin heta ku cenazeyên şehîdan werbigirin û bi merasîmekê layîqî wan wan veşêrin. Ji ber ku şehîd rêya me ya azadî û rizgarkirina gelê me ji zilm û koletiyê ne."

***ANHA***



# Li Hesekê dewreya 4`an ya Tîma Parastina Sivîl qediya

**Foca Agirvemirandinê ya Hesekê dewreya 4`an qedand. Tê de endamên focê perwerdeya teorîk û pratîk yên têkildarî rizgarkirina sivîlan ji karesetan dîtin.**



81 endamên Tîma Parastina Sivîl a Foca Agirvemirandinê ya kantona Hesekê 15 rojan dewreyeke perwerdeyê pêk anî. Di dewreyê de ku destpêka Mijdarê dest pê kir, endaman perwerdeyên teorîk û pratîk ên têkildarî rizgarkirina sivîlan ji şewatan û karesetên muhtemel dîtin.

Waneyên perwerdeyê têkildarî agirvemirandinê, destwerdana lezgîn, xilaskirina kesên di bin jêrzemînan de asê mane, rêbazên veguhestina birîndaran û dermankirina wan bûn.

Di merasîma derçûnê de ku li navenda Foca Agirvemirandinê li dar ket, bi dehan endamên focê, Hêzên Ewlekariya Hundirîn, endamên navend û saziyên sivîl ên bajêr beşdar bûn.

Di destpêka merasîmê de, endamên focê tedbîrên têkildarî şewatan û rêbazên rizgarkirina birîndaran, kesên di avahiyan de asê mane û noqî avê bûne, nîşan dan.

Li gorî berpirsê perwerdeyê Îbrahîm Hisên, Foca Agirvemirandinê ya Hesekê ji perwerdeyê armanc dike endamên Tîma Parastina Sivîl xurtir bike da ku bikarin li hemberî karesetan erkên xwe bi rêk û pêk bînin cih.

***ANHA***



# Li Dêrazorê sûcên dewleta tirkî hatin şermezarkirin

**Bi dirûşma "Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagîrkeriya Tirkiyê li ser axa Sûriyê red dikin" Komîteya Perwerdeyê ya herêma rojhilatê Dêrazorê bi çalakiyekê daxuyaniyek da û êrişên dewleta tirkî şermezar kir.**

Daxuyanî bi amadebûna rûspiyên herêmê û nûnerên meclisên herêmî û mamosteyên xeta rojhilat ji aliyê mamoste û endamê Partiya Sûriya Pêşerojê Hisên El-Xarûf ve hate xwendin.

Di daxuyaniyê de hate gotin: "Em wekî mamostayên herêma rojhilat êrişên domdarên li ser axa Sûriyê şermezar dikin û bang li hemû cîhanê, rêxistinên navneteweyî û koalîsyona navneteweyî dikin ku destwerdanê bikin û sûcên li Serêkaniyê, Efrîn û Girê rawestînin û li gorî daxwazên gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevbigerin."

Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku şerê dewleta Tirk bandorên neyinî dike ku di encamê de qada perwerdeyê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ziyan dît.

Di daxuyaniyê de piştgiriya ji Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) re hate destnîşankirin û wiha hate domand: "Em bang li her kesî dikin ku li dijî êrişên ku aramiyê li herêmên me hedef digire, bisekinin. Em piştgiriya Rêveberiya Xweser dikin. Her wiha piştgiriya Hêzên Sûriya Demokratîk dikin ku axa me rizgar kirine û bi peydakirina hemû xizmetên ji bo herêma Dêrezorê hewl dide aramiyê li herêmê pêk bîne."

Di daxuyaniyê de bang li raya giştî hate kirin ku desteka xwe ji saziyên sivîl û leşkerî yên Rêveberiya Xweser re zêde bikin û hate gotin: "Ev sazî nûnerên yekane yên gelê herêmê ne ku wê ji zihniyeta desthilatdar û dîktator xilas kirin."

***ANHA***





# Eqîle Salih jî bû bernamzetê hilbijartinên serokatiyê yên Lîbya

**Piştî Xelîfe Hefter, serokê Parlamentoya Libya Eqîle Salih roja Şarşem ragihand ku îsal wê beşdarî hilbijartinên serokatiyê ya Libyayê bibe.**


Eqîle Salih diyar kir ku dengdayîn jêdera rewabûna her hikumetekê ye. Her wiha got gel xeyal dike ku bigihêje îstiqrarê û ji tundî û terorîzmê dûr bikeve.

Salih piştrast kir ku ji bo lihevkirineke giştî li Lîbyayê pêk were, lihevkirina neteweyî bingeh e.

Roja çarşemê serokwezîrê Lîbyayê yê berê Elî Zêdan jî pelgeyên namzetiya xwe ji bo hilbijartinên serokatiyê pêşkêş kirinû ku dê di 24'ê Kanûnê de li dar bikevin. Zêdan diyar kiribû ku eger ew were ser desthilatê, ji bo ku lihevkirineke neteweyî di navbera hemû aliyan de pêk were, amade ye tawîzan bide yan jî guhertinê çêke.

Serokê Artêşa Nîştimanî Xelîfe Hefter jî roja sêşemê ragihandibû ku dê beşdarî hilbijartinên serokatiyê bibe. Her wiha kurê Muemmer Qedafî, Seyfulîslam Qezafî jî bernamzetiya xwe ragihandibû.

**ANHA**



# Hêza dagîrkeriyê bişkîne berxwedana gelên herêmê ye

Kadar Pîrê: "Dagîrkeriya tirkî ji bo gelên herêmê tavan bixeter e û wê berxwedana gel hewldanên dagîrkeran bêbandor bike."

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**



Dewleta tirkî ya dagîrker hovîtiya xwe ya li dijî gelên bakur û rojhilatê Sûriyê bênavber didomîne. Yek ji amancên wê yên sereke têkbirina destkeftiyên gelên herêmê ye. Di demên dawî de êrîşên dagîrkeriyê yên bi balafirên bêmirov zêde bûne. Di êrişên wê de, kesayetên civakî û siyasî dibin amanc. Herî dawî di êrişeke hovane de, kesayeta civakî û kurdperwer, Apê Yûsiv şehîd bû.

Li ser êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên li hemberî gelên herêmê û kiryarên wê yên li dijî mirovayiyê, berpirsê Dezgeha Kurdên Bêsînor Kadar Pîrê bi me re axivî.

### Armanca dagîrkeriyê tinekirina destkeftiyan e

Pîrê diyar kir ku dewleta tirkî ya dagîrker, destkefiyên gelên bakur û rojhilatê Sûriyê li ser desthilatdariya xwe xeter dibîne û axaftina xwe wiha domand: "Bi destpêkirina şoreşa Sûriyê re, gelê Kurd sîstemeke demokratîk ava kir. Kurdan pêşengiya projeya Neteweya Demokratîk kir û bi awayekî serkeftî herêm bi rê ve birin. Projeya Neteweya Demokratîk bû bingehê rêxistinbûn û azadiya gelên herêmê. Dema dagîrkeriya tirkî dît ku ev projeya demokratîk pêş dikeve û wê çareseriyê bi xwe re bîne seranserî herêmê, li ser xwe xeter dît. Lewra dixwazin ji aloziya Sûriyê sûdê bigirin û armancên xwe yên dagîrkiriyê pêk bînin. Dewleta tirkî ya faşîst li kû derê hebûna azadiya Kurdan hebe, êrişî wê derê dike."

### Wê gelê Kurd şopdarê têkoşîna şehîdên xwe be

Pîrê da zanîn ku ji bo dagîrkeriya tirkî her Kurdê berxwedêr amance û axaftina xwe wiha domand: "Dewleta tirkî ya dagîrker dixwaze bi êrişên ser berxwedêrên mîna şehîd Yûsiv Gulo, îradeya gel bişkîne. Ji ber wê her kesê berxwedêr û azadîxwaz amanc e. Dagîrkerî bi êrişên xwe yên ser sivîlan, polîtîkaya xwe ya qirkirinê didomîne. Dewleta tirkî ji bo tevayiya gelên herêmê û Rojhilata Navî xeter e. Dewleta tirkî ya qirker di hundirê xwe de di nava kirîzan de ye û siyaseta wê ya dagîrkeriyê li tevayiya qadan têk çû. Ji ber wê bi awayekî hovane êrişî Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê dike."

Pîrê bal kişand ser berxwedan gelê Kurd ya li hemberî êrişên dagîrkeriyê û wiha axivî: "Dagîrkeriya tirkî bi êrişên xwe yên ser kesayetên civakî û azadîxwaz, dixwaze îrade û baweriya gelê Kurd bişkîne. Lê nizane ku gelê Kurd ji şehîdên xwe hêzê digire. Bi dehhezaran welatî beşdarî merasima cenazeyê Apê Yûsiv bûn. Ev ji bo dagîrkeran peyamam bû. Gel diyar kir ku her dilopa xwîna şehîdan, wê di riya azadiya Kurdistanê de bibe fîndek."

Berpirsê Dezgeha Kurdên Bêsînor Kadar Pîrê bal kişand ser rêbazên şerê taybet ku dagîrkeriya tirkî li ser gelên herêmê dimeşîne û axaftina wiha qedand: "Ji ber ku dagîrkerî di siyaseta xwe ya qirkirinê de bin ketiye, li ser gelên herêmê şerê taybet dimeşîne. Hewl dide bi riya sîxurên xwe, Rêveberiya Xweser reş bike. Lê bi saya berxwedana Yekîneyên Parastina Gel YPGê, Yekîneyên Parastina Jin YPJê û gelên herêmê, wê planên wan bêencam bimînin ."

# Cewad El-Beydanî: Xayînên bi Tirkiyê re xeterê çêdikin û QSD li dijî planên Tirkiyê ye

**Lêkolînerê iraqî Dr. Cewad El-Beydanî da zanîn ku li gel dewleta tirkî stratejiyeke kevin heye ku serweriyê li Sûriyê û Iraqê bike û vê jî bi alîkariya xayînan dike.**

Lêkolîner û dîrokzanê iraqî Dr. Cewad El-Beydanî têkildarî gefên dewleta tirkî yên li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê û Iraq û berjewendiyên wê yên dagşrkeriyê û rola QSD`ê ya li dijî planên dagîrkeriyê, axivî.

### STRATEJIYA KEViN

Têkildarî gefên dewleta tirkî yên li dijî Sûriyê û Iraqê Dr.Cewad El-Beydanî wiha got: "Piştî têkçûna dewleta tirkî di Şerê Cîhanê yê Yekê de, strajiyek ji xwe re esas girt. Stratejiya wê ku Heleb û derdora wê, Mûsil heta herêma Zaxo û herêma Samîra, kontrol bike."


### HEVKAR Û XAYÎN JI BO SÛRIYÊ Û IRAQÊ GEF IN'

Girêdayî êrişên dewleta tirkî yên bi balafirên bêmirov û hedefgirtina malbata Gulo ya welatparêz, El-Beydanî wiha got: "Êrişên Tirkiyê berdewam in û dewleta di vê siyasetê de pişta xwe dide ajanên hundir û derve. Lewra balafira Bayraktar bê agahdarî nikare hedefê bigire."

El-Beydanî wiha domand: "Ev tê wateya ku êrişa li hundirê Sûriyê pêk hatî agahiyên wê ji hundirê Sûriyê çûne. Hin kesên tevkar û xayîn li wan herêman hene bi wan re dixebitin. Herwiha li hundirê herêmên Iraqê li Şingalê û hin herêmên din jî ku alîgirên dewleta tirkî û pereyan distînin wan kiryaran dikin."

El-Beydanî hişyarî da, ku ew kesên hevkar û xayîn li ser Iraq û Sûriyê, her wiha li ser QSD'ê û partiyên parastina gelên xwe li hember êrişên şovenîzm ên turanîzm dikin, gef in.

### 'QSD`Ê LI DIJÎ DAGÎRKERIYA TIRKIYÊ YE'



El-Beydanî bang li dewletên herêmê di nav de Iraq kir ku piştevaniya QSD'ê bike û ev tişt got: "Min her tim digot QSD'ê nûnertiya xeta yekemîn a li dijî berjewendiyên dewleta Tirk û tevgerên terorîst ên bi piştevaniya dewleta Tirk tevger dikin. Ji lew re bi rêya çapemeniyê digot piştevaniya QSD`ê bikin."

Cewad El-Beydanî ev tişt anî ziman: "Bi axaftina li ser îslam û milismanan û li ser Mihemed û quranê neyên xapandin. Ev tevahî derew in ku Erdogan bi kar tîne. Ji ber li rojava li ser van tiştan baş hatiye perwerdekirin. Heke em dîroka tevgerên îslamê bixwînin em ê bibînin ku bandora Brîtanyayê li ser avakirina van tevgeran mezin e, her wiha bandora Masoniyê jî li ser heye. Her wiha piranî serokên wê bi siyonîzma cîhanî ve girêdayî ye û Erdogan kontrol dikin. Heta nakokiya di navbera Erdogan û Îsraîlê de berê baş hatiye dîzaynkirin û koordînakirin."

El-Beydanî wiha dewam kir: "Erdogan di her gaveke xwe de bi Îsraîl û DYA'ê re di nava koordînayê de ye. Ji lew re çi êrişek pêk tê bi koordîna pêk tê û armanc jê wêrankirina herêma Ereb û lawazkirina wê, her wiha lawazkirina rihê manewî ya li cem gelê Kurd e. Heke ne wisa be ma koçberiya komî ya Kurdan bi vê hejmara mezin çawa tê şîrovekirin."

Herwiha El-Beydanî got: "Em ê çawa vê şîrove bikin. Ev yek bi sedema rewşa bedbînî ya welatiyê Kurd a ji ber fişara çapemenî, siyasî û zexta dewleta Tirk pêk hate. Niha dewleta Tirk zextekê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Başûrê Kurdistanê çêdike û li van herêman Kurd hene."

***Çavkanî: ANHA***

Fener...



Gelê Kurd bi Rêber APO-PKK re bûye xwedînasname

**Idrîs Henan**

Rêber APO dibêje, tu çiqas rast dibî bibe, dema di rêbaz de tu şaş bî, tu şaş î. Bi gotineke din; dema bingehê avakirina mentiqê mirov şaş be wê rêbaz jî şaş be. Di heman demê de pêwîst dike ku mirov di aliyê zanist, felsefe, ol, efsane û zanyariyên xwe de xwediy hêza afrîner ya reformê be ku manitqê xwe sererast bike. Ev xisûsa yek ji taybetî û nîşanên fikrên pêşeng yên rêveberiyê ne. Lewra rêveberî di cewherê xwe de fikir, nêrîn û stratejî ye. Eger ev hêman di kesayet yan rêxistinekê de kom bibin, şiklê jiyanê jî pê re diyar dibe. Ango; çiqas fikir rast be, jiyan ewqas rast dibe û ewleyiya mirov û civakê dikeve gerantiyê.

Çawa ku rêvebertî xwediya xisûseke wisa ya hişmendiyê ye. Di heman demê de xwediya taybetiya demokrasî û azadiyê ye. Jixwe demokrasî û azadî bi rêvebertiya rast pêkan dibin. Ewleyiya kes û civakê têkûz dibin û şiklê çelûxwar yê di binê banê dewletê de hatî werimandin, di forma kirîz, kaos, anarşî û terorê de xwe dide der û tê zeftkirin. Ewleyiya civakî bi yekîneyên ewleyiyê û vesaziyên zagonî tekûz nabe. Berûvajî; sedemên bêewleyiya civakî ne. Ancax ewleyî di şertên exlaq-polîtîk yên civakên demokratîk de pêkan bin. Bi gotineke din; ewleyî bi rêvebertiya rast dihizire ya xwediya mantiqeke ideolojîk yê jiyana azad, pêkan dibe.

Bi rêvebertiya rast koletî diqede û azadî bi ser dikeve. Li hemberî paşverûtiyê jiyana azad dibe xwedîvîn. Ancax ev li Kurdistanê bi tevgera rast ya Apoyî jiyanî dibe. Rêvebertiya bi dualîteya Rêber APO-PKK tê xuliqandin, rûyê dîrokê û hebûna gelekî li ser keviyên tinebûnê, tê parastin. Pêşî li zordarî, qirkirin û faşîzmê tê girtin û deriyên demokrasî, azadî û ewleyiya neteweyî bi rêvebertiya rast tên vekirin.

Ji bo têkbirina vê hêza ewlekariyê ya civaka Kurdistanê, hêzên mêtinger-qirker bênavber bi rengekî hovane êrişî rêvebertiya Rêber APO-PKK kirin. Li dijî wê dualîteya serkeftinê hemû cureyên zordarî, faşîzm û dijminatiyê dan meşandin. Lê ji ber ku xwediya xisûsa veguherîner e, êrişên qirker yên 43 salan tev têk çûn. Berovajî; destketiyên mezin yên dîrokî hatin bidesxistin.

Çiqas rêxistinbûyîn mezin dibû, asta êrişan mezintir û hovanetir dibû. Li kû rêxistinbûna civakê misoger bûya, ewleyiya wê jî diket garantiyê. Di heman demê de civak û kesayet dibûn qadeke azad ya serketina rêvebertiyê û daneheveke destkeftiyan. Ji ber wê bi demê re; êriş jî asta hundir derbas dikin û di demek kurt de global dibin. Lê dîsa jî nikarin rê li ber destkeftiyên rêvebertiyê bigirin ku li beramberî wê jî rêvebertiya Rêber APO-PKK gerdûnîtir dibe û serketinên cîhanî yên li derveyî sînorên Kurdistanê û Rojhilata Navîn diafirîne.

Armanca wan têkbirina rastiya fikir, nêrîn û stratejiya bi Rêber APO-PKK derketiye re ye. Ango jiholêrakirina rastiya têkoşîna azadiya Kurdan û bêbandorkirina wan e. Ji ber wê berî her tiştî pergala tecrîda li Îmraliyê şidandin û li ser ciwan û jinan êrişên giran pêk anîn. Lê Îmralî bi berxwedana xwe veguherî qadek dîrokî ku xeta rêvebertiya rast tekûztir kir. Di heman demê de rastiyeke nû derxist holê; gelê ku şoreşa yekê ya civakbûnê li dar xistiye, îro bi rêvebertiya Rêber APO-PKK şoreşa duduyan ya Moderntîteya Demokratîk pêk tîne. Êdî gelê Kurd bi rêvebertiya xwe re bûye xwedînasnameya pêşeng ya demokrasî û azadiyê.



# Rêber APO gelekî qehreman û berxwedêr afirand

Bi felsefeya Rêber Apo gelê Kurd xwe ji koletiya desthilatdaran rizgar kir û bû pêşengê gelên azadîxwaz.

**Mihemed Xanim/Qamişlo**



Bi armanca têkbirina vîna gelên Rojhilata Navî, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, 15'ê Sibata 1999'an bi komployeke navneteweyî dîl hat girtin û ji aliyê hêzên komploger ve radestî dewleta tirkî ya faşîst hat kirin. Ev 23 sal in Rêber Apo li Girava Îmralî di tecrîdê de ye. Ev çend sal in dagîrkeriya tirkî nahêle parêzer û malbat wî bibînin. Dewleta dagîrker di kesayeta Rêber Apo de, gelên azadîxwaz dike amanc.

Li ser tecrîda giran ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û kiryarên dagîrkeriya tirkî yên li dijî mafên mirovan, Hevserokê Mala Êzîdiyan ya Herêma Cizîrê Farûq Tozo ev nirxandin kir: "Mirov dikare bêje tecrîda li ser Rêber APO, tecrîda li ser mirovayiyê ye. Lewra di sedsala 21'ê de fikrê li dijî sîstema desthilatdar ya kapîtalîst, fikrê rêber Apo yê Neteweya Demokratîk e. Ji bo wê dewletên hegemon, Rêber Apo dîl girtin û radestî dewleta tirkî ya faşîst kirin. Lê dîsa jî nikarîn pêşî li belavbûna pergala Rêber Apo bigirin. Piştî ku nikarîn vê carê dest bi tecrîda girankirî kirin."

### Gelên azadîxwaz li dora felsefeya Rêbertiyê kom dibin

Tozo bal kişand ser pergala Rêber Apo ya bi parêznameyên xwe li seranserê cîhanê belav kirî û gotinên xwe wiha bi lêv kirin: "Rêber Apo pergala xwe ya Neteweya Demokratîk bi riya pirtûkên xwe bi gel da nasîn û bi van pirtûkan çavê gelên cîhanê gişan vekir. Rojbiroj felsefeya Rêber Ocalan li cîhanê dibe modela jiyana azad. Ji ber wê Rêber Apo bû hêviya tevayiya gelên azadîxwaz."

### Rêber APO Kurdên azad afirandin

Tozo da zanîn ku armanca dagîrkeriyê têkbirina fikrên azad e û axaftina xwe wiha domand: "Dewleta tirkî ji hevdîtina bi Rêbertiyê re ditirse. Lewra eger hevdîtin were kirin wê perspaktîfên Rêbertiyê hem ji bo gelê Kurd, hem ji bo tevayiya gelên azadîxwaz derkevin pêş. Civaka azadîxwaz û demokratîk tev serkeftina xwe di fikrê Rêber Apo de dibînin û ev jî ji bo faşîzma desthilatdaran tirsê çêdike. Ne dewleta tirkî tenê ji vê ditirse, dewletên hegemon giş ji vî fikrî ditirsin. Ji ber wê destekê didin dewleta tirkî. Armanca wan ji vêrakirina fikrên azad ji holê ye. Lê Rêber Apo bi gelên azadîxwaz re ev plan bêbandor kir. Berxwedana Rêber Apo li Îmralî li hemberî vê sîstemê dimeşîne, ji bo gel bûye hêviya herî mezin ya serkeftinê."

Hevserokê Mala Êzîdiyan ya Herêma Cizîrê Farûq Tozo ji gelên azadîxwaz xwest ku li Rêber Apo xwedî derkevin û axaftina xwe wiha qedand: "Ji bo şkandina tecrîda li ser Rêbertiyê, divê em bikarin fikir û felsefeya Rêber Apo di tevayiya jiyana xwe û di sîstema xwe de pêk bînin. Ji bo ku em Rêberê xwe ji nava çar dîwaran derxin, divê 24 saetan em di nava kar û xebatê de bin. Lewra azadiya Rêber Apo, azadiya 50 milyon Kurdî ye."

# `Emê rojên salê tevan bikin rojên têkoşîna jinê`

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**




Mûna Yûsiv: Bi nêzîkbûna rasthatina 25ê Mijdarê em jinên bakûr û rojhilatê Sûriyê vedixwînin vê têkoşînê. Divê li hemberî sûcan derbarê jinê de em hê pirtir xwe bi rêxistin bikin û têkoşîna xwe xurtir bikin."

### `Kongereya Star strageha jina azad û têkoşer e`

Bi nêzîkbûna rasthatina Roja Têkoşînê ya Li Hemberî Sûcên li Hemberî Jinê, Endama Koordînasyona Kongereya Star ya Rojava Mûna Yûsiv ji me re axivî.

Li ser girîngiya têkoşîn û xebata rêxistinên jinan li cîhanê û li bakur û rohjilatê Sûriyê bi taybetî Mûna ev nirxandin kir: "Bi derketina hişmendiya zilam ya serdest û desthilatdariyê sûcên derbarê jinê de dest pê kirin. Ev tê wateya ku sûc dîroka xwe ji dîroka dewlet û desthilatdariya zilamê serdest digire. Di nava 5000 hezar salî de sûcên herî qirêj çi fîzîkî, çi jî derûnî vê hişmendiyê li ser jinê pêk anîn. Ji ber wê pêwîstî dihat dîtin ku li hemberî van sûcan, jin xwe bi rêxistin bike û têbikoşe. Lewra di dîrokê de her tim jin xwediya rola berxwedan û têkoşîna mafê xwe bû. Kongereya Starê jî yek ji van rêxistinên jinan bû ku felsefeya Rêber Apo ya azadaya jinê kir bingehê xebata xwe. Kongereya Star wargeh û Strageha jina azad û ya têkoşer e û ji bo avakirina jiyaneke azad, wekhev û demokratîk têkoşîna me didome."

Endama Koordînasyona Kongereya Starê herwiha da zanîn ku sûcên li dijî jinê sînor tev derbas kirine. Ji ber wê jî karê Kongereya Star li herêmekê sînordar nema û wiha axaftina xwe domand: "Li bakur û rohjilayê sûriyê rêxistin û tevgerên jinan bi yek armancê û di binê yek sîwanê de kar û têkoşînê dikin. Herwiha piştgiriya têkoşîna jinan li her aliyê cîhanê wek erk em dibînin. Jixwe wek Kongereya Star ji bo pêşxistina vê têkoşînê bi rêûrêbazên sûdmendtir karê xwe dike. Ji ber wê em têkiliyên xwe bi sazî û rêxistinê jina re xurttir dikin. Herwiha xebat û bernameyên me li ser bingehê dahûrandin û anlîzkirina pirsgirêkê û pişt re dayîna çareseriyê û planên wê tê kirin. Herwisa sûcên derbarê zarok, mêr, xweza, civak û gelan de wek sûcên derbarê jinê de ji aliyê me ve tên dîtin."

### `Herêmên dagîrkirî ji bo jinan herêmên herî bixeter in`

Mûna di heman demê de rola sereke ya jinê di Şoreşa Rojava de ku hişt hêjayî wê be şoreş bi şoreşa jinê bê binavkirin, herwisa rola wê ya bingehî di rêvebirina pergala demokratîk ya avabûyî de bîr xist û ev gotin lê zêde kir: "Her çend ku li herêmê sûcên li hemberî jinê ji holê ranebûbûne, ew jî sedema wê ya sereke hişmendiya zilam ya serdest e, lê sîstema dagîrkeriyê bi çeteyên xwe yên tundrew sûc zêde kirin û rewşa jinê dijwartir kir. Dewleta tirkî ya dagîrker bi şêwazên herî qirêj sûcên xwe li hemberî jinên têkoşer mîna Hevrîn Xelef pêk anîn. Bi heman hişmendiyê li herêmên dagîrkirî li dijî jinê sûcên herî qirêj didomîne. Li cîhanê jî herêmên dagîrkirî ji bo jinan herêmên herî bixeter in."

### `Emê ji bo azadiyê têkoşînê xurttir bikin`

Endama koodîansyona Kongereya Star bal kişand ser xebata vê dawiyê ya Kongereyê û wiha got: "Xebat rojane û bênavber didome. Lê bi rasthatina 25ê Mijdarê rojane em bernameyên cuda saz dikin û emê wek Kongereya Star pêngavekê ji 20ê Mijdarê heta 10 Kanûnê dest pê bikin. Wê armanca sereke ya pêngavê hişyarkirina jinan û balkişandina ser sûcan be. Pêngava me wê tevayiya gund, navçe, bajar û bajarokên bakur û rojhilatê Sûriyê bigire nava xwe."

Mûna Yûsiv di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku azadiya Rêber Apo wek bingehê têkoşîn û xebata xwe dibînin û axaftina xwe bi vê bangê qedand: "Em jinan tevan vedixwînin vê têkoşînê. Divê li hemberî tecrîda li ser Rêber Apo û di heman demê de sûcan derbarê jinê de em xwe bi rêxistin bikin û têkoşîna xwe xurttir bikin."



Partiya Karkerên Kurdistanê

**Faruk Sakik**

Piştî damezirandina Komara Tirkiyê û serhildanên li bakurê Kurdistanê, li Tirkiyê zexta li ser nasnameya kurd hat sepandin. Li Kurdistanê rê û rêbazên qirkirina civakî yên li her qada civakê û demdirêjî belav bûn. Kurd jî bi hebûn û nasnameyê dihatin parçekirin û ji holê dihatin rakirin. Ji bo vê jî amûrên asîmîlasyon û qirkirinê di dewrê de bûn.

Di demeke wisa de, piştî bêdengiya salên dirêj bi navê Abdullah Ocalan kesek derket ser dika dîrokê. Li Enqerê bû. Li dora wî hin ciwan kom bûbûn. Ji wan re digotin Koma Apocî û demek şûn de bi navê PKK'ê partiyek ava kirin.

PKKê di nava 44 salan de çi kir? Tevgera azadiyê statû-rewş-dîroka Kurdistanê ji kû derê girt heta roja me anî. Gelek tişt kirin, gelek deskeftiyên Kurdan çêbûn. Emê va yek bi yek rêz nekin. Yên van hevokan bixwînin wê bizanin ka em behsa çi dikin. Lê PKKê tişteke cuda fêrî Kurdan kir. Rihekî nû da Kurdan; ruhê berxwedanê.

Ev ruhê berxwedanê, ne di doza Kurdistanê tenê de, di têkoşîna li dijî dijmin de, di heman demê de di jiyana rojane de li hemberî zilm û zorê ka wê helwesteke çawa nîşan bidin fêr kir. Gotinên Mazlûm Dogan yên "Berxwedan Jiyan e" wek manîfestoyeke jiyanê bû. Li hemberî şert û şirûtên xwezayê jî mirov bi vê gotina Mazlûm Dogan li ber xwe dide. Vê têgehê bandoreke wisa li civakê kir ku di bazirganiyê de jî ev gotin îroj tê bikaranîn. Digotin 'dibe te zirar kiribe lê ber xwe bide'.

Ruhê berxwedanê ne li bakurê Kurdistanê tenê di heman demê de li başûrê Kurdistan jî bandora xwe kir. Li hemberî rejima Bees piştî Enfalê ev ruhê berxwedanê hatibû jibîrkirin. Lê bi PKK'ê re ev ruh ji nû e zindî bû. Dema ku Amerîka hat Iraqê ev ruh ket dewrê.

Emê behs nekin ka ev ruh li Rojava çawa bû bingehê şoreşê. Em hemû hê jî şahidiya vê şoreşê dikin.

Derbasî bakurê Kurdistan bibin. PKK di salên 90'î de êdî li her deverê belav bûbû. Li Bakur, dema serhildanan bû. Şer her ku diçû gurtir dibû. Civaka kurd jî li dora PKK'ê weke xelekekê kom dibû. Roj hat navê PKK'ê êdî wek Partiya Karkerên Kurdistanê nedihat bikaranîn. P.K.K. nuqte hatin jibîrkirin. Wek peyvek bi tenê serê xwe 'PKK' bi nav dikirin. Îro jî herin di nav civakê de ji hin kesan bipirsin PKK çi ye. Gelek kes wê nizanibin ku vekirina PKK'ê ' Partiya Karkerên Kurdistanê ye. Wê bibêjin PKK partiya têkoşêrin azadiya Kurdistanê ye.

PKKê tişteke din jî kir. Dema PKK ji bo azadiya Kurdistanê têdikoşiya, Kurd jî ji bo bandora asîmîlasyona salan ji holê rakin ketin nava hewldanan. Ji bo dîrok, ziman, çand, huner û nasnameya kurdî were parastin û pêşxistin xebat dimeşandin. Pirtûk dihatin nivîsandin, film dihatin çêkirin, bi panel û konferansan li Kurdan hestên neteweyî dihatin fêrkirin. Bi van yekan pêşî li asîmlasyonê hat girtin û roj bi roj ber bi azadiyê ve diçû-diçe.

Tişşteke din jî, di her beşa civakê de bi rêxistinbûnê dest pê kir. Îro jî bi sedan sazî û dezgehên Kurdistanî hene. Ev tev berhemên PKK'ê ne. Ev sazî bi serê xwe bûne eniyeke têkoşîna azadiya Kurdistanê. Dijminên Kurdistanê ev yek dîtin û asîmlasyon û polîtîkayên xwe yên qirkirinê danîn aliyekî bi dû tinekirina PKKê ketin. Şerê ku îroj li Zap, Avaşîn, Metîna û Heftanîn dibe ev şer e. Kurdên ku 43 sal in ev keda PKKê dîtine, divê di sala 44'an de pirtir li Tevgera Azadiyê xwedî derkevin.